
Helwesta Saziya Zimanê Tirkî ya li Dijî Zimanê Kurdî



Zana Farqînî

Berî ku ez têkevim mijara xwe, min divê ku ez hin agahî der barê Saziya Zimanê Tirkî (Turk Dil Kurum/TDK) de, bidim. Saziya Zimanê Tirkî, di 12ê Tîrmeha Temûza 1932, yan de bi talîmata Atatürk hatiye damezrandin. Pêşî, navê wê Komeleya Lêkolîna Zimanê (Turkî Türk Dili Tetkik Cemietî) bûye, Paşê delegeyan di kongreya sala 1934 an de navê wê guhartiye û ki-

riye Saziya Lêgerîna Zimanê (Tirkî Türk Dili Araştırma Kurumu)

Lê belê, di kongreya sisiyan de (1936), endaman careke din navê saziyê guhartiye û navê wê yê îro lê daniye; Saziya Zimanê Tirkî (Türk Dil kurumu).

Atatürk n tine Saziya Zimanê Tirkî daye damzrandin, wî her wisan Saziya Dîroka Tirkî (Türk Tarih Kurumu) jî daye avakirin. Ev sazî serê pêşîn di Avrêla

(Nîsana) 1931ê de bi navê Komeleya Lêkolîna Dîroka Tirkî (Türk Tarihi Tetkik Cemiyeti) hatiye avakirin, navê vê jî paşê hatiye guhartin û navê îro lê hatiye danîn (3 Kewçêr/ Çiriya pêşîn 1935).

Ev her du sazî, ku yek li ser zimanê tirkî û ya din jî li ser dîroka (mêjûya) tirkî dixebite, ji hêla Ataturk ve hatine avakirin û gava ku Mustafa Kemal Atatürk miriye, pareke baş

ji mîrata xwe ji van her du saziyan re hiştiye. Heta dibêjin ku gava li ber mirinê li ber sekeratê bûye, ji bestan xeber daye ango bêhiş peyîviye û gotiye (Dil efendim dîl) Ziman mîrê min ziman). Îro ev her du sazî, di warê teorîk de îdeolojiya fermî ya Komara Tirkîyeyê ya kemalî xurt dikin, Ev her du damezirawê, hîn jî hebûna gelê kurd û zimanê wî, dîrok û raboriya wî napejirînin. Bi gotina kurt û bi kurtasî, ev her du sazî di xizmeta îdeolojiya fermî ya dewletê de ne.

Wek agahî divê em bibêjin ku, Partiya Gela komarê (Cumhuriyet Halk Partisi/ CHP) jî ji aliyê Ataturk ve hatiye avakirin (9 Rezerber/ Îlon 1923) û ew jî pareke baş ji mîrata Ataturk distîne. Ev partî jî di warê rsiyasetêde pêkhênerê îdeolojiya fermî ya kamalî ye.

Piştî van kurtehaydariyan, em bîna ser dabeşa xwe yahîmî u ew jî saziyê zîmnê Tirkî ye. Ev saziya navborî, heta niha

deh caran Ferhenga Tirkî çap kiriye. Ferheng cara pêşîn di 1945 an de û cara dawî jî di sala 2005 an de çap bûye. Her çap jî aliyê gencîneya peyvan ve ji ya beriya xwe mezintir û berfirehtir. Bi gotineke din, di her çapa nû de ferheng tê nûkirin, peyv lê tîr zêdekirin û berfirehtirkin.

Helwesta vê saziyê li dijî zimanê kurdî helwesteke xerabe ku tam li gorî bîrdoziya (îdeolojiya) kemalî ye. Saziya Zimanê Tirkî heta jê hatiye cih nedaye peyva (kurd) û (kurdî) Jixwe peyva kurdistan jê re wekî hesine ku çawan dibêjin cin ji hesin ditirsîn, a ew jî wisan xwe dûrî vê peyvê dide.

Çendî ku helwesta wê her diçe piçek be nerm dibe jî, lê belê ev sazî hîn jî, em dev jê berdin ku hebûna kurdan û zimanê wan li bakurê kurdistanê qebûl bike, li cîhanê jî napejirîne, ji bo helwestê û mebesta vê saziya ku dabeşa me li sere, bê fehm kirin, em çend mînakan pêşkêş bikin.

Wek nimûne, di çapa pêncemîna ferhenga vê saziyê de, ku di sala 1969 an de hatiye çapkirin, li hemberî madeya kurd (ku bi tirkî kurt dibêjin) ev gotin

hene: (Navê wê civata ku pirî wan tirk in lê belê wan zimanê xwe ghartiye, bi farisiyeke xerab diaxivin ku li Tirkîye, Îran, Îraq û Sûriyeyê dijîn û kesê ji vê civatê).

Belê em ne gel an jî netewe ne, li gorî vê terîfê em civatek in ku bi binyat û rese-

niya xwe ve jî tirk in; ku çî heyf me zimanê xwe ji bîr kiriye û îro bi fari-siyeke şikestî û bed dipeyîvin.

Her wiha, di heman çapê de, li hemberî peyva kurdî (bi zimanê tirkî kurdî) jî ev daxuyanî hene:

1_ Perdeya ku di muzîka rojhilat de dirûvê notaya sî bemol pê dixê.

2_ Meqamekî ku qerarê wê li ser perdeya dugahê ye. Ji bo peyva kurdî ku di zimanl tirkî de berginda wê kûrtçe ye, tenê tebîra zimanê kurdî cih girtiye.

Di çapa heştan a sala 1988 an de peyva kurd (bi tirkî kûrt) wiha hatiye şîrovekirin:

Civateke ku li Asyaya pêş dijî û kesê ji vê civatê ji bo berginda peyva kurdî (Kurdi) jî ev gotin hene:

1_ perdeya ku di muzîka rojhilat de dirûvê notaya sî bemol pê dixê.

2_ Meqamekî ku qerarê wê li ser perdeya dugahê ye.

Di vê çapa ferhengê de bêjeya kurdî an jî zimanê kurdî (ango kurtçe, kurd dili) tune ye. Tenê mirov dibîne ku di vê çapa hanê de, helwesta saziyê ya li dijî peyva kurd hinek nerm bûye û negotiye ku kurd bi resena xwe tirkin lê belê zimanekî colê şikestî bi kar tînin Em wek civateke Asyaya pêş hatine ragihandin.

Em bîna çapa dawî ya Ferhenga Tirkî, ku di 2005 an de çapa dehem pêk hatiye. Lênêrîn û ramana saziyê ya der

barê (kurd) (kurdî) û (zianê kurdî) Kurtçe de neguheriye. ka em bi hev re bala xwe bidin gotinên wan ên ku li hemberî van bêjeyan nivîsîne di nav kevanekê de min bi taybetî bilêvkin û şêweya wan a di zimanê tirkî de jî dan:

Kurd Kurt: Civateke ku li Asyaya pêş dijî û kesê ji vê civatê.

Kurdî Kurtçe: Zimanî kurdî.

Kurdî Kurdi: 1 perdeya ku di muzîka klasîka tirkî de dirûvê notaya sî bemol pê dixê.

2_ Meqamekî ku li ser perdeya dugahê ye.

Ji van her sê mînakên jî xweş aşkera dibe ku, di zêhniyet û lîênêrîna wana der barê kurd û zimanê kurdî de guherînek pêk nehatiye û her bi çavê destpeka çêkirin û duristkirina îdeolojiya fermî li dabaş û mijarê dinêrin. Îcar di vê çapê de kurdî kurdi wek meqamekî muzîka klasîka tirkî hatiye nîşandan, ku di çapên berê de wek meqamê muzîka rojhilat hatibû diyarkirin.

Ev saziya kemalî çawan helwesteke wiha ne zanistî û ilmî li hemberî kurdan û zimanê kurdî nîşan dide, her wisan xwedî şêl û reftareke wilo ye ku dibêje tu peyv ji zimanê kurdî neketiye nav zimanê tirkî.

Belê saziya zimanl tirkî dadixuyîne ku ji bîst û çar zimanan peyv ketine zimanê tirkî û her wiha bi lîsteyekê jî navê van zimanan û peyvên ku ji wan zimanan ketine nav zimanê tirkî diyar dike.

Li ser Înternetê bi navnîşana

www.tdk.gov.tr mirov bi hêsanê dikare bi-keve malpera wan û xwe bigihîne van agahiyan û vê listeyê listeya ziman û hejmara peyvên ku ji van zimanan ketine zimanê tirkî li jêrê ye. Min tenê dest li navê zimanan gerand û li gorî bilêvkirina zimanê kurdî ew nav sererast kirin.

Almanî	85
Arnawidî (Zimanê Albanan)	6463
Bulxarî	1
Erebî	8
Ermenkî	23
farisî	1374
Finî	2
Fransizî	4974
Îbranî	9
Îngilîzî	538
Îspanyolî	36
Îtalyanî	632
Japonî (Zimanê Yabanan)	7
Korekî (Zimanê Koriyan)	1
Iatînî	147
Macarî	19
Moxolî	13
Norwecî	2
Portekîzî	4
Rûmkî	14
Rûsî	40
Slavî	24
Soxdkî (Zimanekî mirî yê Îranî ye)	1
Yewnanî/ Grekî	399

Çi heyf û sed mixabin di nav vê listeyê de, mirov çavê xwe digêrîne nagerîne rastî peyveke tek ku ji zimanê kurdî ketibe zimanê tirkî nayê. Lê li gorî wan peyvek ji zimanê soxdkî heye ku ev ziman zimanekî îranî yê mirî ye. Lê belê dîsan em dikarin bi gorinên wan bipeyîtînin û biselmînin ku ne peyveke tenê ya soxdkî, herî hindik du peyvên soxdkî di zimanê tirkî de hene. Li gorî Ferhenga Tirkî, etîmolojiya peyva (kent) ku hemwateya bajar û şar/ şehre, jî (kantha) soxdkî tê.

Binyat û koka vê bêjeyê û bêjeya me (gund) eynî ye. Hemmehneya vê peyva gund jî di kurdî de dih dewe.

Ji ber ku ev sizaya kemalî hebûna kurdan napejirîne, loma jî xwedî helwesteke welê ye ku cih nade gotina kurdî, bi gotinke din gava etîmolojiya peyvan aşkera dike, koka peyvên kurdî nadin. Dema ev sazî vê yekê jî dike serî li sê rêbaz û riyan dide, Yan eslê Peyvê farisî nîşan dide, Yan bi tirkî nîşan dide yan jî bi awayê zimanê gelêrî ku bi tirkî jê re dibêjin halk dîlî, nîşan dide.

Gava ku peyv di zimanê farisî de jî hebe, wê hingê nikarin û naşên reseniya peyvê veşêrin, loma li pêşberî wê, kurtebêjeya far (farisî) datinin û didin xuyakirin ku eslê peyvê farisî ye.

Li hêla din îcar gava ku peyva kurdî ya ketiye zimanê tirkî, di farisî de nebe koka wê nîşan nadin û ev yek jî tê wê mehneyê ku peyv bi tirkî ye. Riya din jî eve:

Çaxa peyv di nav gel de zêde berbelav nebûbe û ne nasyar be, kurtebêjeya (hld) (halk dîlî) ango zimanê gelêrî li pêşberî wê datînin heta koka hin peyvên kurdî wekî erebî nîşan didin. Peyva me ya tirsîn ku mîna (tirmsak) ketiye zimanê tirkî, ji vê yekê re nimûneyeke balkêşe.

Peyva (lawik) ku mîna peyveke argo wek (lavuk) van salên dawiyê bi saya serê Standupkar sînemager, şanoger û nivîskarê bi eslê xwe kurd Yilmaz Erdoganê Hekarî kete nav zimanê tirkî mîna peyveke resena tirkî di çapa dawî ya Ferhenga tirkî de hatiye xuyakirin, peyva (tiro viro) jî dîsan bi awayê tiri viri di ferhengê de cih girtiye, nehatiye diyarkirin ku ev peyveke kurdî ye.

Me got ku vê saziyê di fergengê de, koka hin peyvên kurdî bi tebîra zimanê gelêrî daye. Em çend mînakan ji van peyvan derpêş bikin, da ku agahdariyeke baş a xwînerên birêz ji vê rewşê çêbe. Pêşî emê awayê bilêvkirina wana bi kurdî û paşê jî awayê bilêvkirina wana bi tirkî pêşkêş bikin û di nav kevanê de jî hemwateyên wan ên dn bidin an jî terîfa wan bikin. Peyvên me evin:

qalûç: kaluç (şalok, dasok, kasok, dasa dextî dasa palehiyl, dasgenim)

qelen: Kalin (nexd, qelendê bûkê)

sekû, sekûk: seki (sekûya li ber an jî nav malan)

qestel: kastar qesar, (qesirandin, qesarkirin, qesarkirina caw)

çîr: çir çîrên încas û mişmişan

kax: kak (kaxên hîrmî û kaçînan)

karix: Karik (erxa li dora bax û bexçeyan)

Di pey van peyvên kurdî de, ku wek peyvên ji zimanê gelêrî hatine nîşandan, em niha jî li ser hin bêjeyên ku wek peyvên tirkî hatine xuyakirin rawestî û çend mînakan ji wan derpêş bikin. Em dê dîsan pêşî awayê bilêvkirina wana kurdî û paşê jî awayê wanê ku di tirkî de tê bilêvkirin, bidin.

çakûç: çekiç

koç: goç

koçer: goçer

pincar: pancar (pincara çiyê)

qert: kart (tiştê ku êdî ne teze ye, kesê ku kal û pîre)

xir: hir (xirecir, teqereq, teşqe)

ewêl: aval (gêj, xêtik, kawik)

belge: belge (wesîqe, ku ji belgan jî pelkê tê)

Niha jî em çend nimûneyan ji peyvên ku di ferhengê de koka wan bi farisî hatiye nîşandan, derpêş bikin. Dîsan em pêşî awayê wan ên kurdî de, paşê awayê wan ên di tirkî de û her wisan, em awayê bilêvkirina wan ên di farisî de jî di nav kevanê de bidin xuyakirin.

baxçevan: bahçivan (bi farisî: baxçeban, baqçeban)

beygir: beygir (bi farisî: bargir)
birinc: piring (bi farisî: berenc)
ciwan: civan (bi farisî cevan.)
çarik/ çarox: çarik (çarux, çaruq)
Çeqel: çakal (bi farisî çexal, şexal, şegal)
çanax: çanak (bi farisî cunax)
kostek: kostek (bi farisî: kûstik)
kiçik/ qicik: kuçuk bi farisî: kûçek)
narinc: narinc (bi farisî: nareng)
post: post (bi farisî: pust)
sert: sert (bi farisî: sard)
zengîn: zengîn (bi farisî: sangîn)
zerdelî: serdali (bifarsî: zerdalu)

Ev peyvên li jorê çendî di farisî de jî hebin, xweş tê xuyakirin ku ev bêje ne ji farisî lê belê ji zimanê kurdî ketine nav zimanê tirkî.

Başê em vê yekê ji çî derdixin û em çawan digihîjin biryareke welê vebir û mîsoger. Ji bilêvkirin ango telafûza wana ku di zimanê tirkî de heye em tê derdixin ku ev peyv ji zimanê kurdî derbasî zimanê

tirkî bûne, ne ji farisî: Em nabêjin ku peyv ji farisî neketine navz imanê tirkî na. Ji vî zimaê îranî jî gelek peyv ketine zimanê tirkî û rêjeya wan jî gelege.

Di encamê de em diên wiha bibêjin:

ji ber ku Saziya Zimanl Tirkî saziyeke bîrdoziya fermî ye, ne bi endîşeya zanistî lê belê bi endîseyên îdeolojîk û siyasî tev digere.

Loma jî naperîne ku zimanê tirkî ji zimanê kurdî peyv, biwêj (îdyom) û gotinên pêşiyên girtine, heta ji destê vê saziyê tê, lê dixebite ku di warê zimannasiyê de bi-peyvîne, biselmîne ku zimanê kurdî ne tu zimane.

Ji lew re, saziyê ji xwe re rêbezeke wi-san çêkiriye ku yan peyvên kurdî yan wek peyvên farisî yan wek peyvên ji zimanê gelêrî yan wek ku koka wan tirkî be, nîşan bide. Lê çî feyde ku rim di têrê de hilnayê û pîsî jî bi berfê nayê nixamtin. Rastî wek giyayê karûş û fîrêzeyê ye, di bin axê de namîne û dertê ber roniyê.

